

*Şahnameya Kurdan Civîna Nemiran* berhemeke teqrîben ji şeş hezar beytan pêk hatiye. Berhem ji du cildan pêk tê ku şair navê berga ewil daniye *Civîna Nemiran* û ya duyem jî daniye *Civata Nemiran û Şoreşên Kurdî*. Di cîlda ewil de Palo dike ku lehen-gên Kurd ên dîrokî bi teknîkên monolog ên navxweyî, bi heman rengî kesayetên bi navên simbolîk bide axaftin. Di cilda duyem de jî şairên Kurd ên serdema klasîk li dor çarçoveya mantiq û honandineke şanoyî dide axaftin û rêça dîrokî ya têkoşîna Kurd bi awayekî serkeftî tîne zimên. Palo di vê berhemê de Kurd û Kurdistanê datîne naven-dê û li dor van, li ser mijarên wek despotîzm, çînen civakî, koletî, kolonyalîzm, nezanî, bêdewletbûn û hwd. hin pêşniyazên bingehîn kirine ku ev pêşniyaz hê jî rastiya xwe wenda nekirine. Şair doza Kurd û Kurdistanê ji xwe re kiriye bingeh; herwiha jîyan, ax, welat û gelek baweriyên din ên mîtolojîk, hizr û ramana dîrokî û jiyana rasteqîn, wekî hêmanên bingehîn ên pêkhatina vê zanava etnîkî tesewur kiriye. Ji vî alî ve ev berhem bêhn û teşeya *Şahname* ya Fîrdewsî dide.



9 786257 1383509

www.nubihar.com [f](#) /nubiharwesana [t](#) @nubihar [@](#) @nubihar\_yayinlari [v](#) nubihar

Nûbihar

ŞAHNAMEYA KURDAN  
CIVÎNA NEMIRAN  
MELA EHMEDE PALO



ŞAHNAMEYA KURDAN  
CIVÎNA  
NEMIRAN  
MELA EHMEDE PALO

Amadekar

Mehmet Yıldırımçakar • Rêzan Palo • Veysel Başçı • Yakup Aykaç



Nûbihar

Mela Ehmedê Palo

-Şahnameya Kurdan-  
**CIVÎNA NEMIRAN**

## **Nûbihar**

Pak Ajans Yay. Tur. ve Dış Tic. Ltd. Şti.  
Zeyrek Mah. Serdab Sk. No: 26/3 Fatih/İstanbul  
Tel & Faks: 0212 519 00 09  
www.nubihar.com | email: info@nubihar.com

Yayın Sertifika No: 51437

Weşan No: 364 | Edebiyat - Helbest

### **-Şahnameya Kurdan- CIVÎNA NEMIRAN (Cild: I-II)**

Mela Ehmedê Palo

### **Amadekar**

Mehmet Yıldırımçakar, Veysel Başçı, Yakup Aykaç, Rêzan Palo

ISBN: 978-625-7383-50-9

Çapa Yekem: 2022

•

### **Gerînendeyê Giştî yê Weşanê**

Süleyman Çevik

### **Edîtor û Mîzanpaj**

Huseyn Zana

### **Berg**

IHB

•

### **Çapxane**

Step Ajans Matbaa Ltd. Şti.  
Göztepe Mah. Bosna Cad. No: 11  
Bağcılar-İstanbul  
Tel: 0212-446 88 46  
Matbaa Sertifika No: 45522

Mela Ehmedê Palo

-Şahnameya Kurdan-  
**CIVÎNA NEMIRAN**

(Cild: I-II)

**Amadekar**

Mehmet Yıldırımçakar, Veysel Başçı  
Yakup Aykaç, Rêzan Palo

**Nûbihar**

**Mehmet Yıldırımçakar**, ji Wanê ye. Li Zanîngeha Marmarayê (2009) ji beşa Matematîkê derçû. Bernameya masterê bi teza “*Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de; Nimûneya Herêma Wanê*” li Zanîngeha Muş Alparslanê (2017) qedand. Niha bernameya doktorayê bi teza “*Aûraya romanên Mehmed Uzun di nav Derbirîneke Gelêrî de; Dîrok, Penaberî û Şer*” li Zanîngeha Bîngolê didomîne. Li ser mijarên wekî teoriya edebiyatê, edebiyata cihanê, edebiyata berawirdî, edebiyata post-kolonyal, edebiyata Kurdî ya modern dixebite.

**Veysel Başçı**, ji Batmanê ye. Piştî xwendina xwe ya seretayî û navîn çû Îranê. Li Zanîngeha Qezwînê, di beşa Ziman û Edebiyata Farişî de lîsansa xwe qedand. Piştî wê di heman beşê de, li Zanîngeha Tehranê mastera xwe temam kir. Bi teza xwe ya bi navê “*Hicw û Nezireyên Civakî û Siyasî li Serdema Meşrûtiyetê di Navbera Îran û Osmanî de*” li Zanîngeha Tehranê (2014) di heman beşê de doktoraya xwe wergirt. Di warê Îranolojî û Kurdolojiyê de wekî pirtûk, gotarên zanistî û edebî gelek lêkolînên wî hene. Hê jî di wî warî de xwendinên xwe yên akademîk, çandî û hunerî didomîne.

**Yakup Aykaç**, ji Wanê ye. Li Zanîngeha Marmarayê (2010) ji beşa Perwerdeya Matematîk a Lîseyê derçû. Bernameya masterê bi teza “*Dîwana Hezîn (Metin, Lêkolîn û Ferheng)*”, li Zanîngeha Bîngolê (2015); bernameya doktorayê jî bi teza “*Patronaja Edebî di Mîrekiya Kurdan de (1514-1846)*” li Zanîngeha Dîcleyê (2020) qedand. Niha wek lêkolêr li Zanîngeha Mardin Artukluyê di Beşa Ziman û Çanda Kurdî de dixebite. Li ser mijarên wek edebiyata klasîk û dîroka edebiyata Kurdî xebatên xwe didomîne.

**Rêzan Palo**, lawê Mela Ehmedê Palo yê biçûk e. Di sala 1963an de li gundê Belê yê li ser Amûdê, Rojavayê Kurdistanê ji dayik bûye. Li Qamişlo xwendina xwe ya seretayî û navîn qedandiye. Ji ber ku Kurdênên Sûriyeyê bêyî nasname bûn, nekariye piştî lîseyê xwendina xwe bidomîne. Li Şamê hîni karê porbiriye bûye. Bi salan li Qamişlo wek porbir kar kiriye. Li Qamişlo bi karên siyasetê re jî mijûl bûye û wextekî serokatiya tîmeke fûtbolê jî kiriye. Piştî sala 2011an wek penaber koçî Bakurê Kurdistanê kiriye. Çar salan li Nisêbînê êwiriye. Dûre digel malbata xwe derbasî Almanyayê bûye. Niha li Berlînê dijî û salona xwe ya porbiriye dide xebatê. Rêzan Palo tevî malbata xwe, her sal xelata wêjeyî ya Mela Ehmedê Palo didin nivîskarên Rojavayê Kurdistanê. Wî kedeke mezin xerc kiriye û dike bo ku berhemên bavê xwe biparêze û bide çapkirin.

## NAVEROK

PÊŞGOTIN.....	13
JIYAN Û BERHEMÊN MELA EHMEDE PALO .....	17
ŞAHIDIYA MELA HUSNÎ HEZÎN DERBARÊ MELA EHMEDE PALO DE .....	27
ÇEND GOTIN DERBARÊ NÎQAŞÊN LI SER BERHEMÊN MELA EHMEDE PALO .....	31
NAVEROKA BERHEMÊ .....	37
HONAKA BERHEMÊ .....	57
ZIMAN Û USLÛBA BERHEMÊ.....	63
RÊ Û RÊBAZA AMADEKIRINA BERHEMÊ Û HIN NÎŞEYÊN GIRÎNG .....	67

### CILD-I

#### Civîna Nemiran

<b>Civîna Nemiran</b> .....	75
Pehlewî û Civîndarî.....	75
<b>Berên Civînokê</b> .....	79
Vekirina Hevparan .....	81
Perwer û Pehlewî.....	82
Destpêka Civînê .....	83
<b>Fermangeha Destikan</b> .....	109
Vekirina Hevparan .....	111
Destpêka Civînê .....	112

Serwer û Jevder .....	116
Jevder û Berder .....	116
Kevnar û Perwer û Jevder .....	118
Nûker û Jevder û Perwer .....	127
Jevder û Berder .....	133
Berder û Nûker .....	133
Jevder û Perwer.....	134
Jevder û Berder .....	138
Jevder û Berder .....	140
Jevder û Perwer.....	141
<b>Bêcivîn û Civîndar.....</b>	<b>145</b>
<b>Kur û Dê .....</b>	<b>151</b>
<b>Bexçevan û Bêwijdan .....</b>	<b>159</b>
Vekirina Hevparên Civîna Pêşî .....	161
Civîna Pêşîn .....	162
Civîna Tevan ji bo Xwedîtiya Kurdan.....	176
Şiyariya Civîna Dawî.....	181
Civîna Paşîn .....	184
Yekîtiya Her Çaran [Bi Dengê Birayê Jîndar].....	190
<b>Pîlana Cengê .....</b>	<b>195</b>
Vekirina Hevparên Civîna Paşî .....	197
Vekirina Hevparên Civîna Pêşî .....	199
Şiyarkirina Her Pêncan.....	201
Destpêka Civîna Pêşîn.....	202
Gotara Her Çaran di Mala Hevar .....	233
Destpêka Cengê.....	233
Tevdîra Dijmin.....	235
Civîna Paşîn .....	236
Dawî.....	249
<b>Civîna Komelparêzan.....</b>	<b>251</b>
Vekirina Hevparan .....	253
Destpêka Civîne .....	254
Zerkeş û Serkeş .....	256
Zerkeş û Kûreş .....	270

Kelbeş û Serkeş .....	273
Zerkeş û Kûreş .....	275
Kelbeş û Kûreş .....	276
Bêleş û Kelbeş.....	277
<b>Baxê Rengîn .....</b>	<b>279</b>
<b>Va Tê .....</b>	<b>287</b>
Vekirina Hevparan .....	289
Destpêka Civînê .....	291
<b>Dawola Bêdîlan Dîlana Bêdawol.....</b>	<b>309</b>
Vekirina Hevparan .....	311
Civîna Pêşîn .....	312
<b>Koma Bêparan .....</b>	<b>313</b>
Zerkeş û Bêbeş .....	315
Hevpar û Bêpar .....	319
Civîna Paşîn .....	330
<b>Roja Rizgarî.....</b>	<b>339</b>
Destpêk .....	341
Civîn.....	342
<b>Fermangeha Dijminan .....</b>	<b>363</b>
Vekirina Cîgîran.....	365
Vekirina Dilêran .....	366
Yekîtiya Dilêran .....	369
Civîn.....	370
Civîna Dilêran ji bo Fermanê.....	375
Fermana Girto.....	383
Fermana Virto.....	391
Perwaz û Derbaz .....	392
Fermana Zirto .....	400
<b>Dildar û Dilber.....</b>	<b>407</b>
Civîn.....	409
<b>Civata Nemiran tê da pirsyariya Xanî .....</b>	<b>419</b>
Civîna Derban û Mêvan .....	424
<b>Xwepesindana Gulistana .....</b>	<b>449</b>
Destpêka Civînê .....	454



## CILD II

### Civata Nemiran û Şoreşên Kurdî

<b>Civata Nemiran .....</b>	<b>463</b>
Danzana Hevparan.....	465
Tevdîra Dîna Bihiştê.....	467
<b>Destpêka Civîna Pêşîn: Dibistana Şehîdan .....</b>	<b>473</b>
<b>Civîn.....</b>	<b>475</b>
Derban û Zerwan .....	475
Derban û Zerwan .....	476
Zerwan û Derban .....	479
Derban û Zerwan .....	481
Zerwan û Derban .....	484
Derban û Zerwan .....	491
Fûad û Zerwan.....	501
Zerwan û Derban .....	501
Zerwan û Derban .....	505
Zerwan û Pezîr.....	506
Zerwan û Pezîr.....	508
Rêber û Zerwan .....	509
Rêber û Zerwan .....	510
Derban û Zerwan .....	512
Zerwan û Dilawer .....	513
Zerwan û Şêr .....	516
Şêr û Zerwan .....	517
Qehreman û Zerwan.....	517
Zerwan û Qehreman .....	519
Zerwan û Qehreman.....	520
Zerwan û Berdev.....	530
Zerwan û Berdev.....	530
Zerwan û Serwer.....	531
Zerwan û Serwer.....	532

Zerwan û Derban .....	538
Zerwan û Îmamî.....	539
Zerwan û Îmamî.....	540
Zerwan û Derban .....	541
Zerwan û Bîrewerî.....	542
Zerwan.....	543
Zerwan û Derban .....	548
Zerwan û Zengene .....	548
Aware û Zerwan.....	550
Zerwan û Aware.....	551
Zerwan û Mela Mîrza.....	551
Zerwan û Mela Husên.....	552
Zerwan û Diktor .....	557
Diktor û Zerwan .....	557
Zerwan û Debîr.....	558
Zerwan û Debîr.....	559
Şiyar û Debîr .....	559
Debîr û Zerwan.....	560
Zerwan û Derban .....	562
Zerwan û Derban .....	563
Zerwan û Derban .....	565
<b>Civîna Paşîn: Gulistana Edîban.....</b>	<b>567</b>
Civîn.....	569
Zerwan û Derban .....	571
Zerwan û Derban .....	577
Derban û Zerwan .....	579
Evîndar û Zerwan.....	579
Zerwan û Sadiq.....	583
Zerwan û Girgaşî.....	589
Zerwan û Bekir Begê Erizî.....	592
Zerwan û Şêx Nûredîn Birîfkî .....	593
Zerwan û Mela Ehmedê Xasî .....	596
Zerwan û Baba Tahir .....	599

Zerwan û Pêşeng .....	601
Zerwan û Pêşeng û Derban .....	602
Pêşeng û Zerwan .....	602
Zerwan û Nalî .....	606
Nalî û Zerwan .....	607
Nalî û Zerwan .....	608
Zerwan û Feqiyê Teyran .....	609
Zerwan û Derban .....	610
Zerwan û Feqî .....	611
Zerwan û Muxtar .....	614
Zerwan û Edeb.....	617
Zerwan û Tahir Beg.....	619
Zerwan û Hemdî .....	621
Zerwan û Salim.....	624
Zerwan û Narî.....	626
Zerwan û Herîrî.....	629
Zerwan û Batê û Termokî .....	631
Zerwan û Çend Toreदार .....	635
Zerwan û Mewlana Camî.....	638
Zerwan û Zehawî .....	640
Zerwan û Derban .....	640
Zerwan û Muradxan û Şerefxan.....	642
Zerwan û Şerefxan .....	643
Zerwan û Birrek Toreदार .....	647
Zerwan û Ahî.....	647
Zerwan û Derban .....	650
Zerwan û Bêkes .....	651
Zerwan û Zîwer .....	653
Zerwan û Pîremêrd .....	655
Zerwan û Pîremêrd .....	656
Zerwan û Mewlana Xalid.....	657
Zerwan û Mewlana Xalid.....	659
Zerwan û Koma Toreदार .....	661

## Çend Şoreşên Kurdî

Şoreşa 1607an .....	667
Şoreşa 1806an .....	670
Şoreşa 1812yan .....	672
Şoreşa 1820an .....	674
Şoreşa 1826an .....	677
Şoreşên 1829-1839an.....	679
Şoreşa 1830an .....	681
Şoreşa 1834an .....	683
Şoreşa 1835an .....	685
Şoreşa 1839an .....	687
Şoreşa 1853an .....	691
Şoreşa 1879an .....	693
Şoreşa 1881-1885an .....	696
Şerê 1881-1885an .....	698
Şoreşa 1889an .....	703
Şoreşa 1908an .....	705
Şoreşa 1913an .....	706
Şoreşa 1912-1914an .....	708
Şoreşa 1919-1931an .....	711
Şoreşa 1919-1931ê.....	713
Şoreşa 1922-1930an .....	716
Şoreşa 1925-1927an .....	719
Kêmketina Şoreşê.....	722
Soreşa 1927-1931ê.....	730
Şerê Dersîmê yê 1929-1933yan.....	734
Şoreşa Dersîmê ya 1877-1878an .....	736
Tevgera Îsmail Paşayê Badînanî (1835-1842) .....	740
Tevgera Êzdîn Şêr (1853-1856) .....	742
<b>ENCAM</b> .....	<b>745</b>
<b>JÊDER</b> .....	<b>749</b>



## PÊŞGOTIN

Di atmosfera siyasî ya sedsala 20an de para doza neteweyî ya Kurd -digel derfetên kêr- şerkirin û têkoşîn bû li dijî sirgûn, înkâr, asimilasyon û tunekirinê ya ku ji ber perçebûnê diqewimî û dihat serê wan. Di vê şer û têkoşînê de li her pênc perçeyên Kurdistanê rewşenbîr û ronakbîr li pêş bûn. Helbet gelek ji wan rewşenbîr û ronakbîran şair û edîb bûn. Cardin vejandina hişmendiya neteweyî ya Kurd a ku bi giranî birîndar ketibû û, zindîkirina hizra milî ya ku axa sar lê hatibû reşandin, barê vê hêj di sêrî de ketibû ser navmilên van rewşenbîran. Di vê sedsalê de rewşenbîr û arîstokratên Kurd tiştê ku ji wan hatibûn hêvîkirin, bê guman, kiribûn. Komele û cemiyetên wekî *Kürdistan Teali Cemiyeti* [Komeleya Bilindkirina Kurdistanê], *Kürt Millet Fırkası* [Partiya Gelê Kurd], *Azadi Cemiyeti* [Komeleya Azadî] ku berê li Bakur hatibûn dameziran-din, bi avabûna komarê re xwe fesix kiribûn û derbasî Rojava/ Binxetê bûbûn. Ew rewşenbîr û pêşeng di sala 1927an de li devera Bihemdûn a Lubnanê hatibûn bal hev û damezirandîna Komeleya Xoybûnê îlan kiribûn. Ji ber vê yekê, careke din xîmên neteweperweriya Kurd a nûjen hatibû danîn ku, di sedsala 20an de jî bandora wê dê berdewam bikira. Endamên vê komeleyê li Lubnan, Şam, Heleb û ser tixûbê Iraqê xebat û çalakiyên baş dimeşandin. Di heman demê de li Ewropa û dîasporayê jî hin xebatên lobiyê pêk hatibûn.

Alimên ku bi eslê xwe ji tradîsyona medreseyê dihatin jî

piştgirî didan xebat û çalakîyên têkoşîna neteweyî ya rewşenbîran. Lêbelê hem ji ber îstîdalen hermenotîk ên ji ber nêrîna dînê Îslamê li hember zanav û neteweyan peyda dibûn, hem jî ji ber nêzîkbûna civak û dewletên misilman ên dorberê, ev piştgirî negihîştibû asteke baş. Ji dîndariyê, ne têkoşîna gel, bes têkoşîna dînî dihat fêmkirin. Ji ber vê sedemê, alimên medreseyan bi temkînî nêzîkî vê meseleyê bûbûn lê rewşenbîrên serbixwe di têkoşîna neteweyî de rehetir tevgeriyabûn. Di medreseyên dînî de ew kesên ku parastina doza neteweyî dikirin, pêşniyaza hin tiştên li ser bingeha zanavê dikirin, an jî xwedî hizir û ramanên neteweperwerî bûn weyaxût, di navbera Îslam û neteweperweriyê de nebûna dijberiyê dianîn zimên, belê, gelek caran zor û zexta dorberê li ser wan kesan çêdibû. Ji ber vê yekê em dikarin bibêjin wê hingê doza neteweyî mîna pola êgir bû ku tu kesekî di nav sazîyên dînî de nedikarî rahijîta destê xwe.

Îja, Mela Ehmedê Palo yek ji wan aliman bû ku bi destê xwe rahijîtibû vê pola êgir. Wî doza neteweyî ya Kurd li dijî sazîyên dînî bi awayekî mutedîl lê bi rengê sade parastibû. Wî, bi şîrên xwe reçeteya rizgariya ji statukoyê bo gelê Kurd nivîsibûn ku ji hezaran beytan pêk dihatin. Ew der heqê netewebûnê de bi rewşenbîr, ronakbîr, sosyalîst, şair û nivîskarên azadîxwaz ên wekî Celadet Elî Bedîrxan, Kamiran Elî Bedîrxan, Cegerxwîn, Qedrîcan, Hesên Hîşyar, Nûredîn Zaza û Osman Sebrî re di heman nêrîna de bû. Lêbelê ji aliyekî din ve wî bi parastina zanava xwe ya alimîyê ku di medreseyên dînî de perwerde dîtibû, wekî Martin Luther, serî li dijî hin têgihîştinên dînî û neteweyî yên van sazîyan jî rakiribû. Bê şik, di vî warî de profileke wî ya cuda hebû.

Mela Ehmedê Palo di nîveka duyem a sedsala 20an de jiya-ye û di salên 1960 û 70yan de jî bi awayekî berhemdêr gelek şîrên epopîk nivîsîne. Palo herçiqasî di medreseyên klasîk ên Kurdan de perwerde bûbe jî, ew ne şairekî kelambêj û fiqihbêj e, ne jî şairekî mutesewuf e ku şîrên dînî an jî aşîqanê nivîsîne. Berevajiyê vê yekê, ew şairekî wisa ye ku van hemû edet

û kevneşopiyan pir baş dizane lê, di wî de têgihîştineke kûr a epope û qehremaniyê heye. Hemî şî'rên wî bi şêwazên helbestên Kurdî yên klasîk hatine nivîsîn, helbestên epopîk in û xweserî xwe ne. Herwiha gelek formên taybetiyên helbestên klasîk ên wekî wezn, arûz, qafiyê, qafîyeya hundurîn, lef û neşr, mur'etu'n-nezîr û hwd. helbestên Palo xemilandine ku vê yekê jî şî'rên wî ji hêla teşeyên edebî ve xurtir kiriye. Van şî'rên ku bi Kurdiya Kurmancî hatine nivîsandin, ji hêla nave-rok û formê ve îlhama xwe ji *Şahnameya Fîrdewsî* girtine. Di medreseyên klasîk ên Kurdan de kevneşopiya “Şahname-xwîni” [xwendina Şahnameyê] yan jî “Şahname-nûsi” [nivîsandina Şahnameyê] ya ku îlhama xwe ji *Şahnameya Fîrdewsî* girtiye, ji bilî hin îstîsnayan, zêde nehatiye dîtîn. Ji ber vê sedemê, helbestên Palo di warê şikandina vê têgihîştinê de roleke girîng girtiye ser xwe û herwiha di zaravayê Kurmancî de ji helbestên epopîk re bûne mînak, lewma pir girîng in. Helbesta wî ya bihêz û nêrîna wî ya ji helbestê, berî her tiştî bêhn û teşeya Şahnameyê dide ku M. Muhîd Tebatebaî jê re gotiye “Pirtûka Pîroz a Kurdan”. Loma meriv dikare berhema Palo bişibîne bi *Şahnameya Fîrdewsî*. Ji ber vê sedemê me jî navê herdu bergên vê berhemê danî *Şahnameya Kurdan Civîna Nemiran*.

Ev xebata bi navê *Şahnameya Kurdan Civîna Nemiran* du-yemîn berhema edebî ya Palo ye ku piştî “Dewr û Gera Kurdistanê” cara ewil e çap dibe. Ev berhema giranbiha cara ewil e ku bi rêya tîpguhêzî û edîsyoneke ciddî dê bê pêşberî xwîneran. Ev berhem ji du bergan pêk hatiye. Navê berga ewil “Civîna Nemiran” û ya duyem “Civata Nemiran û Şoreşên Kurdî” ye. Di berga ewil de Palo dike ku lehengên Kurd ên dîrokî bi teknîkên monolog ên navxweyî, bi heman rengî kesayetên bi navên sembolîk bide axaftinê. Di berga duyemîn de jî şairên Kurd ên serdema klasîk li dor çarçoveya mantiq û honandineke şanoyî di metna xwe de dide axaftinê û di beşa duyemîn a vê bergê de jî rêça dîrokî ya têkoşîna Kurdan bi awayekî serkeftî dixê nav forma helbestê û vedibêje.



Palo, di vê berhema ku li ber destê we de ye li dor despotîzm, çînên civakî, koletî, kolonyalîzm, nezanî, bêdewletbûn û hwd. hin pêşniyazên bingeîn kirine ku hê jî rastiya xwe wenda nekirine. Wî hinek caran rexneyên ciddî li dîn û aliman kiriye, û li ser girîngiya perwerde, zanîn û hişyarbûnê sekiniye. Wî gelek mijarên dîrokî, siyasî, mîtolojîk û zanavî yên ku Kurdan ji nêz ve eleqedar dikin li seranserî helbestên xwe raçandiye. Herwiha ji helbestên Palo tê dîtîn ku şairtiya wî zatî ye. Ji ber şairtiya wî em dikarin bibêjin, edebiyata ku ji hêla vî helbestvanê girîng ve hatî pêşandan, bêguman, namzet e ku bibe yek ji wan xîmên sereke ya edebiyata Kurdî ya klasîk.

Em bi weşandina berhemeke ewçend bihêz a şairekî ewqas girîng gelekî kêfxweş in. Herwisa em dîsa kêfxweş in ku piştî xebateke dûr û dirêj, bi şêwr û sebateke hevpar, ji per û rûpelên du defterên herişî û rizîbûyî filitîn. Em spasîyên xwe pêşkêşî birêz Roşan Lezgîn dikin ku wî bi nivîsa xwe ye bi navê “Kayıp Bir Kürd Aydını: Ehmedê Palo” Mela Ehmedê Palo anî rojeva Kurdên Bakur û nivîsa xwe ya bi navê “Jiyan û Berhemên Mela Ehmedê Palo” ji nû ve revîze kir û destûr da me, da ku em nivîsa wî di vê xebatê de bi cî bikin. Dîsa helwesta lawê Ehmedê Palo, Rêzan Palo, şayanê teqdirê ye. Wî kedeke mezin xerc kiriye bo ku berhemên bavê xwe biparêze û bide çapkirinê. Herwiha em spasiya xwe li weşanxaneyê *Nûbiharê*, xasma Huseyn Şemrexî dikin ku weşandina xebatê bi hesasiyeteke ciddî û akademîk kirin û bûn sebeb ku ev berhem gihîşt ber destê xwînerên hêja. Divê em vê yekê jî diyar bikin ku her rexne û tenkît û tesbîtkirina şaşîyên li vê berhemê dê pêşîya me ronîtir û geştir bikin.

**Amadekarên Berhemê  
2022, 21ê Adarê  
Mêrdîn (Serê Binxetê)**